


**Ebdela Peşêw**

**Berhemên bijarte**

**Helbest**



**Husên Hebeş**

**ev „Berhema bijarte“ aniye ser nivîsa latînî.**

**Ferhengok jê re daniye.**

**Bi kurmcîya bakurî hevalcêwiya wê nivîsiye.**

**Ji dîwana „Birûske çandin“  
1973 – 1988 Kurdistan 2001**

**Kudeta**

Pêş tonasin  
minallêki xoperist bûm:  
Wam dezani,  
asmani pan dewarêke,  
tenya bo min helldirawe.  
Zewî durrgey diway tofane,  
cige le min,  
hiç kesêki tya nemawe.  
Evîni to lepîrr hat u  
şûre u qellamî xapûr kird,  
rrengekanî hemû gorri,  
yasakanî jêrujûr kird.  
Way kird dinya  
bo tenyayîm wek qefes bê.  
Fêri kirdim –  
şewan nîw serînim bes bê!

1.12.1973. Varronêj

Kudeta : încîlab, pêş to nasîn : berî nasîna te, minall : zaro, xweperist : ji xwe hez kirî, wam dezanî : weha min hizir fikir, dewar : xêvet; kon, tenya : tenê, helldirawe : venane, zewî : zevî; erd, durge : girav, cige le min : ji bilî min, hîç : nekes, ewîn : evîn, lepîrr : ji nişkava, şûre : diwar, qella : kela, xapûr kirin : kavil kirin, yasa : qanûn, fêr kirin : hîn kirin; hoy kirin, serîn : balgî.

## **Încîlab**

Berî nasîna te ez  
zaroyekî xweperist bûm:  
min weha dizanî,  
esmanê pehn xêvetek e,  
her ji min re hatiye venan.  
Zevî, girava paş tovanê ye,  
ji bilî min,  
tukes li ser nemayî.  
Lê ji nişkava,  
evîna te hat  
diwar û kela min kavil kir,  
hemî reng guhartin,  
qanûn li nav hev xistin.  
Dinya li min kir  
bêrkîma tenêtiyê,  
ez hîn kirim –  
bi şevan nîvbalgiyek ji besê min be!

1.12.1973. Varonêj

## **Futboll**

Ajansekani dengubas rayangeyand:  
Yariyekî futboll dekirê.  
Dû tîpeke – Kirêmil u Koşkî Sipî.  
Top – Serî kurd.  
Goll – Kurdistan.  
Temaşaker – dinyay kirrî wek gorristan.

3.11.1973. Mosko

Futboll : goka(topa) pê, dengubas : nûçe, rayangeyand : nûçebelav kirin, yarı : lîsk; lîstin,  
tîp : tîm, top : gok, temaşaker : nirînvân; temaşevan, kîrr : bédeng.

### **Goka pê**

Ajansên nûçeyan ragihandin:  
Lîskeke goka pê dest pê dike:  
Herdu tîm – Kirêmil û Koşka Sipî.  
Gok – serê kurdan.  
Gol – Kurdistan.  
Nirînvân – dinya bédeng, bédengiya goristanî

3.11.1974. Mosko

### **Newrozî 1977**

To mişûrî agir mexo.  
Serit Leser singim danê,  
bizane, killpe u nêlley gîrr  
çi deka bo em Newroz e!  
Minîş ser be baskit dekem,  
way bo şewî tarîkî wa.  
Baskî rûtî çî agirêkî pîroze!

20.3.1977. Mosko

Mişûr : xem, killpe : pê; billêse; rivîn; alaf, nêlle : gurgura pêtê, bask : zend.

### **Newroza 1977**

Tu xema agirvêxistinê mexwe.  
Serê xwe dîne ser sîngê min,  
tu yê bizanibî gurgura rivînê  
çi dike bona vê Newrozê!  
Ezê jî serê xwe dinim ser pîbaskên te,

ax! Di şeveke we tarî de,  
pîbaskên te yên rût dê çi agirekî pîroz be!

### **Bo Morag Donaldson**

Lem jîyaney pîr herada,  
le belemî şequşîrî  
ber tewjîmî pêl u bada,  
zor detîrsim  
bazî giyanî xeyallgîrî xom bizir kem,  
mawem nebê  
dû pîrozey çawekanî to nemir kem.

Le êstawe  
min xemxorî asmanîşim:  
Paş çawî to,  
êdî asman çon bitwanê,  
beyaniyan, ke radebê,  
le samallî xoy birrwanê!

4.5.1978. Mosko

Lem jîyaney : li vê jiyana, hera : qalmeqalm; qelebalix; têrêş, belem : kelek, şequşîrî : neliserhev; xîrxwîte; şikestî, tewjîm : zerp; zor, baz : teyrê baz, giyan : can, xom: ê xwe, bizir kirin : hinda kirin, mawem nebê : fersenda min tune be, le êstawe : jî niha de, çaw : çav, çon bitwanê : çawa karibe, beyaniyan : sibeyan, samal : sayî; semal, birrwanê : binire.

### **Bona Morag Donaldson**

Di vê jiyana têrêş de,  
di keleka xîrxwîte de  
ya di nav tewjîma pêl û bê de,  
pîr ditîrsm  
ez bazê xeyalhîlgîrê canê xwe hinda bikim,  
fersenda min tune be

herdu çavên teyî fîroz abedîn bikim.

Ji niha de

ez xema esmên dixwim:

Piştî nemana çavên te,

wê çawa kanibe

beyaniyan, gavê hişiyar dibe

li semala xwe binire!.

4.5.1978. Mosko

### **Dayk**

Bo Cemîle – ser dadexem.

Bo Jan Dark û Tirêşkova – ser dadexem \*

bellam jinêk le xakî pîrr mergî minda,

pê le cergî xoy binêt û bibê be dak,

le ber pêyda kirrnûş debem,

nawçêwanim desûm le xak!

30.8.1979. Potsdam

\* Cemîle Buheyrêd : kiçefîdakarî cezairî.

Jan Dark : kiçe qaremanî firensî.

Tirêşkova : yekem jine kosmonawt (gerdûngerr).

Dayk : dê; dêk, ser dadexem : serê xwe datînim, ditewînim, bellam : eger; lê,

xak : erd; ax, merg : mirin, pê le cergî xoy binêt : pê li cigerê xwe bike, dak : dê, dêk, le ber

pêyda : li ber pêyên (lingên) wê de, kirrnûş debem : kunde; secde dikim; nawçewan : enî,

desûm : paş dikim.

### **Dê**

Bona Cemîlê - serê xwe datînim.

Bona Jeanne d'Ark û Tirêşkovê - serê xwe datînim.

Lê li ser axa welatê minî mişt ji mirinê

her jinek cigerê xwe bike bin lîngan û bibe bi dêk,

ez li ber lîngên wê kunde dikim

û eniya xwe bi wê axê paş dikim.

30.8.1979. Potsdam

### **Merc**

Min qet dijî ewe nîm  
diktator cîhan bigirin,  
sêberî Xwa bin, zor bin.  
Bellam mercêkim heye:  
Minallan diktator bin!

22 / 23.1979 Berlin - Warşo

Merc : şert, min : ez, qet : qe; bi carekê, sêber : sî, sih, Xwa : Xwedê, minall : zaro.

### **Merc**

Ez qe ne li dijim  
diktator cîhanê bigirin,  
siya Xwedê bin, pir bin.  
Lê tenê merceke min heye:  
Bila diktaor zaro bin.

22 / 23.1979 Berlin - Warşo

### **Şipirzeyî**

Ew rojey jiwanman heye,  
herçî destî bo debem:  
Piyalley ça, kitêb, qelem ...  
hemû gullaw derdeden.  
Ew rojey jiwanman heye,  
hêşta zûwe u to dûri,  
endamekanî leşim  
nobetbirri lêk deken:  
Çaw - rezî leşit derrnê,

dest - be dengta helldeznê,  
guê - nuqmî bonit debê u  
mewday dûrît depêwê ...  
biriya detzani, giyane,  
ew rojey jivanman heye,  
çon serim lê deşêwê!

22.11.1979. Mosko

Şipirzeyî : şerpezeyî, jivan : jivan; soz, herçî : her tişt, destî bo debem : destê xwe  
davêjim ê, piyale : kasa çayê, gullaw : gulav, derdeden : derdixin, edndamekan :  
lebatan, leşim : govdê min; bedena min, nobetbirrî : nobeyê dibirin, derrinê :  
diçine, dengta : dengê te, helldeznê : hildikşe, guê : guhê xwe, nuqm: noq bûn;  
fetisîn; xeniqîn, bonit : bihna te, mewda : mesafe; bergeh, depêwê : dipîve, biriya :  
xwaskê : kêşka, serim lê deşêwê: serê min gêj dibe.

### **Şerpezeyî**

Di wê roja jivana heye de,  
ez destê xwe davêjim çî:  
Piyala çay, kitêb, qêlem ...  
hemî di nav lêpê min de dibine gulav.  
Di wê roja jivana me heye de,  
teví ku hîn zû ye û tu dûr î,  
lebatên govdê min  
nobeyên xwe şaş dîkin:  
Çav - rezê govdê te diçinin,  
dest – bi dengê te re hildikşin,  
guh – di nav bihna te de noq dibin  
û bergeha teyî dûr dipîve ...  
Xwaskê te zanîba, canê,  
di wê roja jivana me heye de,  
çawa sergeşte dibim!

22.11.1979. Mosko

### **Şewnwêjî Namoyan**

1

Le her cêyek çiya bibînîm -  
dillim,  
wek le jiwani yekemmda,  
dadexurpê, radeçillekê,  
sersam dewestim le binya ...  
wa têdegem,  
le çiyayî minrra dest pêdeken  
çiyayekanî hemû dinya!

Şewnwêjî : şevnimêj, namoyan : biyanîyan; xerîban, le her cêyek : li her çiyekî,  
dadexurpê : dil lêdide, radeçillkê : dil dilerze, sersam : sergerdan; matmayîn,  
dewestim : disekinim; radiwestim

### **Şevnimêja namoyan**

1

Li her çiyekî çiya bibînîm -  
dilê min,  
mîna di jivana mine yekemîn de,  
lêdide, dilerze,  
sergerdan dimînîm li binarê ...  
weha têdigîhnîm,  
hemî çiyayên dinyayê  
ji çiyayê min dest pê dîkin!

2

Le her kwê kanî bibînîm -  
dillim,  
wek le jiwani yekemmda,  
dadexurpê,  
radeçillekê,  
pêş ewey binî pêwe nêma,  
le berdemya  
be hêminî çok dadedem,  
qewzey serî  
wek şabiskî şorrejinêk



şane dekem,  
çünke min wam be birda dê,  
ke şîrnawî gişt kanîyekan  
le niştîmanî minrra dê!

Le her kwê : li her kuderê, pêş ewey bîni pêwe nê : berî ku devê xwe têxînim, li berdemya : li pêşê, be hêminî : bi bédengî; bi aramî, çok dadem : çoka xwe datîim, qewze : kevz, şabisk : biska; keziya; guliya tevî ciwan, şorrejinêk : riddirîn; bedewtirîn jin, şane dekem : şe dikim, wam bebîrda dê : weha bîr dikim; difkirim, şîrnaw : ava şîrîn.

2

Li kuderê kaniyê bibînim -  
dilê min,  
mîna di jivana yekemîn de,  
lêdide,  
dilerze,  
berî tehma xwe bişkînim  
li pêşiyê  
bi hêminî çoka xwe datînim,  
kevza sêrî  
zêrbiska zerîyekê  
şe dikim,  
çinkê ez weha diramînim,  
ku hemî kaniyên avîje  
welatê min derdibin!

3

Sermay gelêk şaranim dî,  
belam pencem lego neçûn,  
çünke sermayî hemû cêyek  
tişkêk rojî niştîmanî minî tyaye.  
Germay gelêk şaranim dî,  
bellam giyanim werris nebû,  
çünke germay hemû cêyek  
sîrweyekî niştîmanî minî tyaye.

Şar : bajar, pence : tilî, lego neçûn : ne tevizîn, tişkêk : tirêjek, werris : bêzar; ji xwe aciz bûn, sirweyek : bayekî hunik.

3

Serma pir bajarê min dît,  
lê tiliyên min ne tevizîn,  
çinkê serma her ciyekî  
tirêjek tava welatê min tê de ye.  
Germa pir bajarê min dît,  
lê canê min bêzar ne bû,  
çinkê germa her ciyekî  
sirweyeke welatê min tê de ye.

Sirwe : ferasîn; bayê hunik.

4

Çawî kiji ewrupayî  
ger şiniş bê - xoşim dewê.  
Ger sewziş bê - xoşim dewê.  
Wa têdegem:  
Şirintirîn çaw,  
sewztirîn çaw  
lem dinyaye,  
tozêk reşî  
çawî kiçî  
niştimanî minî tyaye!

Çaw : çav, kij : keç; qîz, xoşim dewê : bi min xweş e; jê hez dikim, sewz : kesk,  
tozêk : kêmek; hindikek, kiç : keç; kij; qîz.

4

Çavên keçên ewropayî  
eger şin bin jî - ez jê hez dikim.  
Eger kesk bin jî - ez jê hez dikim.  
Weha têdigihnim:  
Şirintirîn çav,

kesktirîn çav  
li vê dinyayê  
hinekê reşîya  
çavên keça  
welatê min tê de ye!

5

Niştimanim!  
To wek taney leser çawim.  
To wek temî,  
le gişt lawe dewret dawim.  
To awêney -  
le naw toda hemû dinya bedi dekem.  
To teymanî -  
be hoy towe hiç nabînim:  
ne kel debînim, ne zewî.  
Ne Xwa debînim, ne esman.  
Ca nazanim  
ne cîhan wek to biçûke,  
ne to gewreyî beqed cîhan.  
Niştimanekem – K u r d i s t a n!

29.11.1979. Mosko

Tane : perde, tem : tem û mij, li gişt lawe : ji her alîkî de, awêney : eyne; nînik, bedi  
dekem : dibînim, teyman : çeper; sinc; perjîn, be hoy to : bi sedema te, hiç : qe;  
her, kel : aso; hesû, Xwa : Xwedê, gewre : mezin.

5

Welatê min!  
Tu wek perdekê tê ber çavê min.  
Tu tem î,  
ji her aliyekî de te ez hawîr kirime.  
Tu nînik î -  
dinyayê tevde di te re dibînim.  
Tu perjîn î -  
li ber çavên min:  
ne hêso dibînim, ne zewî,

ne Xwedê dibinim, ne esman.  
Car nizanîm  
Ne cîhan wek te biçûk e,  
ne tu mezin î biqasî cîhanê.  
Welatê min - K u r d i s t a n!

### **Daristanî sûtaw**

Her nazdarê dillî damê,  
le binarî dillda naştîm,  
wek nemamê.  
Ta wam lêhat,  
le say serî xoşewîstan,  
bûme maxoy şadaristan!

Ke tom nasî,  
ey nemamî şilk u nemir,  
wam zanî toş deçite pall ewanî tir:  
Derrwêy, debêt  
be fênkayî ... bo hawînim.  
Be germayî ... bo zistanîm.  
Keçî, lepîrr bûy be şemçe u  
Girrit berda daristanîm!

### **Daristana şewitî**

Her nazliyekê dilê xwe da min,  
li binara dilê xwe  
wek nemamê min çand,  
ta we li min hat,  
bi saya evîndaran,  
bûme xudiyê şadaristanê!

Dema min tu nas kir,

tu, nemama nestêleye nemir,  
min hizir dikir tu ji diçi ba wan,  
li wir direwzî, dibî  
hunkayî ... bo havîna min.  
Germayî ... bo zivistana min.  
Lê ji nişkava bûyî darkê kibrîtê  
û te agir berda daristana min!

30.11.1979. Mosko

